**Kifşkirina nivîsê ya bi hev re**

Tîpên nivîsê û sembol bala zarokên we dikişînin.
Bi alîkariya we dikarin veşareyên nivîsê derxînin holê.
Kaxez û pênûs wan vedixwînin xweceribandinê.




**Serdana pirtûkxaneyan**

Pirtûk dikarin bibin hevalên baş. Di pirtûkxaneyan de hûn dikarin tev li zaroka/ê xwe pirtûk û medyayên din bi demborî bistînin.




**Bikaranîna medyayên cûda**

Serpêhatiyên bi hemû libatên hîskirinê û bi liv û tevgerê, li derve jî wekî cûrbicûriya medyayan divê di rojaneya zarokatiyê de hebe. Di kifşkirina çîrokên di pirtûkan de, di pirtûkên guhdarîkirin û pêkaneyên li ser internetê de rê şanî zarokên xwe bidin.



**Afirênderiya di çêkirina wêne û nivîsandinê de**

Xêzkirin û boyaxkirina li ser kaxezê, bi hevkarî kişandina wêneyan a bi telefon û tabletan heyecanê dide zarokên we ku xwe bi rêka wêne û zimên îfade bike.



# Bi çîrokan mezinbûn

Bi vî awayî hûn di salên pêşîn ên jiyanê de piştgiriyê didin zarokê xwe jibo pêşketina ziman û xwendinê.



SIKJM
ISJM
ISMR

Kurdisch Kurmandschi / Kurde Kurmandji / Curdo Kurmanci

### Bi zimane Zikmaki biaxivin

Ger hûn bi zimanê ku hûn herî baş dizanin bi zarokê xwe re biaxivin, hûne ji bo fêrbûna zimanen dîn, zêdetir bingehek ewle bide wan.



### Guhdarkirin û bersivdan

Zaroka/ê we gava bi we re diaxive, zimanê xwe li pêş dixe. Gava hûn pê re di derbarê çavdêriyên wî/wê de diaxivin, ew xezîneya xwe ya peyvan firehtir dike û coşa fêrbûniyên nû pê re çêdibe.



### Kêfxwesiya li ser zimên a bi hev re

Bi zimên mirov dikare pir xweş bilîze. Rêzbend, stran û lîstikên bi liv û tevger, bi zaroka/ê dide jiyandin bê ziman çiqasî dikare kêfxweşiyê bide.





### Gotina çîrokan û lênêrîna wêneyan

Çîrok û wêne ji zaroka/zarokê we re cihanên nû vedike. Ew dikare bi vê rêkê cîhanên nû kifş bike û gelek peyvên nû nas bike.



Xetkirin: Claudia de Weck

### Instîtuta Swîsrî ya ji bo Medyaya Zarok û Ciwanan SIKJM/ISJM/ISMR

SIKJM/ISJM/ISMR xwe ji bo wêjeya zarok û ciwanan û bi pêşxistina xwendinê erkdar dibîne. Ew projeyên rê ve dibe, daku zarok û ciwan bi kêfxweşî têkevin cîhana ziman û wêjeyê, Bi vî awayi nîşanî pispor, dê û bavan dike, le ew çawa dikarin di pêşveçûna ziman û xwendina zarokan de alîkariye bikin.

Di malpera SIKJM/ISJM/ISMR de hûn ê **şiretên medyayê** û agahiyen bingehin ji bo beyt û qafiye û xwendine bi bîst zimanan cûda bibînin.

Di çarçoveya **Buchstart / Nê pour lire / Nati per leggere** de, hûn ê pakêteke pirtûkan ji bo Zaroken xwe ye ku nû hatine dînyaye hilînin. Pirtukxane ye we vexwînin bo dem a qafiye û çîrokan. Li Swîsre Qantonen ku bi almanî û fransî diaxiven, hûn dikarin di projeyê **Schenk mir eine Geschichte / 1001 histoires** da bi bîst zimanên zedetir serdana çirokxwendine ya anîmasyonên bikin.

**Agahiyên zêdetir:**
www.sikjm.ch / www.isjm.ch / www.ismr.ch

SIKJM
ISJM
ISMR

Schweizerisches Institut für Kinder- und Jugendmedien

Institut suisse Jeunesse et Médias

Istituto svizzero Media e Ragazzi